Ji Penûsê Jinê Rastîya Jîyanê

RAPERÎN

Dîrok: Hezîran 2025 Hejmar:16 Biha: 1000

JIN Û SOSYALÎZM

ROJEV 2 — Em ê Bi Wêrektîya Şoreşa Jinê Dorpêça Desthilatdarîya Zilam Hilweşînin

NEZERÎ 3 — Ji Bo Çi Sosyalîzm

JINA CIWAN 7 — Xeyalên Şehîdên Pirsusê Di Destê Jinên Ciwan Mezin Dibe!

Em Ê Bi Wêrektîya Şoreşa Jinê Dorpêça Desthilatdarîya Zilam Hilweşînin!

Rojhilata Navîn navenda herî êrîşkar a serdestîya zilamperest e. Di serî da dewleta tirk a înkarker û mêtîngehkar, her wiha Iraq, Îran, Îsraîl, Erebistana Siûdî û Sûrîye di heman enîya dijminahîya jinan da ref digrin. NATO ya ku hêza şer a zilamperestîya kapîtalîst û emperyalîst e, li dijî têkoşîna jinan a ji bo wekhevî û azadîyê wek navenda fermandarîya vê enîya mêtingehkar, înkarker, cîhadîst û faşîst e. Li dijî vê dorpêça herî paşverû ya zilamperest şoreşa me ya jinan a Rojava bi şerkirin, berxwedan û rêxistinbûyînê karîbû bijî. Ew li dijî enîya kapîtalîst, emperyalîst û mêtingehkar, di mewzîya herî pêş a enîya jinan da bû, xwedîyê vê rûmet bû.

Eger jinên di şoreşa Rojava da wêrekîya şerkirina li dijî çeteyên cîhadîst û faşîst ên wekî El Nusra, DAIŞ, SMO an HTŞ nîşan nedabûna, an jî li dijî êrîşên dagirkerîyê yên dewleta Tirk a mêtingehkar di enîya pêş da cih negirtibûna, şoreşa Rojava nikarîbû bibe şoreşa jinan. Ger jinên li Rojava û Bakur û Rojhilatê Sûrîyê di hemû mekanîzmayên şer û avakirinê da temsîlîyeta wekhev bi dest xistibin, bingeha vê yekê pozîsyonên wan ên herî pêşketî yên di çeperên şer da ne. Jinek ku çek di destê xwe da digire hemû darazên nirxên civakî û çandî serûbin kirîye. Ger em serokeşîr û sîyasetmedarek jin di heman çarçovê da bibînin, ev ne tenê xuyakirineke, ev rastîyek bi dest xistî ye. Nûnertîya jinan di şandeya ku di 1ê Hezîranê da çû Şamê da pir girîng e. Û ya ku ji vê yekê balkêştir e hebûna YPJ di vê şandeyê da ye. Di hevdîtinên li hemberê hikûmeta nû ya cîhadîst a Şamê, ku bi qanûnê mafê jinan ya hilbijartina her pîşeyê sînordar kirîye da beşdarbûna li ser navê fermandarîya artêşa jinan, YPJ, bûye sembola şoreşa jinan, rêxistinbûna jinan û hişmendîya zayendî. Rewşa şênber ji alîyê hêzên dij-şoreşger ve ferzkirina rastîyekê û qebûlkirineka bi zorê ye. Şoreşa me ya jinan dikeve sala xwe ya 13an, û ew bûye yek ji kêlîyên sembolîk. Jin ne tişteka ku wek li Reqa, Şengal û Minbicê DAIŞ dixwest di tarîya dîrokê da veşêre, bike kole, pêşkêşî mêran bike, an jî li bazaran bifroşe. Wan xwe birêxistin kirîye, artêşek ava kirîye, şer kirîye û bûye kirdeyek çalak a dîrokê.

Şoreşa me ya jinan a Rojava niha li ser bergehek nû ye.

Di sedsala 20an da Kurdistan carekê bi Peymana Sicus Picut hate parçekirin, û dû ra bi Peymana Lozanê ya 1924an neteweya Kurd hate înkarkirin û paşguhkirin bi vê ra qonaxek nû di dagirkirin û îlhaqkirinê da dest pê kir.

Sal 2025 e. Ji alîyê cihgirtina stratejîk a hemû hêzên şoreşger û dij-şoreşger yên li Rojhilata Navîn ve, ev serdemeka nû ye. Û di vê konjonktura nû da, bi taybetî li Rojava neteweya Kurd, hêza dîyarkirina mafê xwe bi dest xistîye, ev hêmana sereke ya dîyarker e. Bi rastî jî pêşketineka dîrokîye ku netewa mêtingeh û jina ku despêkê bûye mêtingeh di vê astê da hêza gotina biryardar li ser çarenûsa xwe bi dest xistine. Ev asta ku li Rojava hatîye bidestxistin, êdî wê di têkoşîna hemû gel, bawerî û bê guman jin ên bindest û hemû nasnameyên zayendî yên bindest ên Sûrîyê da rolekê bilîze. Niha, şoreşa jinan a Rojava ji bo gelên bindest ên elewî, durzî, xiristîyan, êzîdî, ereb, tirkmen û ermenîyan dibistanek hêz û têkoşînê ye ku xwe bispêrin. Konferansa Jinên Kurd biryardarîya xwe ya parastina destkeftîyên xwe tekez kirîye. Ev pir watedar e ku jinên Ereb li Reqa, Tebqa û Dêra Zorê, di bin pêşengîya Rêxistina Jinan a Zenûbya da, bi hêza ku ji şoreşa jinan wergirtine, li dijî zilm û zordarîya zilamperest bi hev ra xwe birêxistin kirine. Divê careka din were gotin ku çi dayik be, çi hevjîn be, çi jî jina herî qebûlkirî be, rewş naguhere. Jin êdî ji vê rastîyê agahdar in.

Civînên jinan ên li Şam, Heleb û Suweydayê, û çalakîyên hevgirtinê yên bi jinên elewî yên peravê ra ji bo afirandina bingeha îtifaqa jinan girîng in.

Li hember kevneşopî û çanda serdesta ku jin wekî welatîyên tebaqa duyemîn têne dîtin ku exlaqê feodala burjuva ya serdest e, û xuyangên heman zîhnîyetê ne, ji bilî rêxistinbûn û şerkirina bi hemî rêbazan, tu rêya rizgarîya jinan tune.

Destûra nû ya ku ji hêla HTŞê ya cîhadîst ve hatî ragihandin, destûrek bi tevahî dijminê jinan e. Bê guman, jinên ji Rojava- Bakur û Rojhilatê Sûrîyê dê vê destûrê qebûl nekin.

Ew di Komara Ereb a Sûrîyê da israr dikin. Xeta birdozî, sîyasî û civakî ya HTŞê xeta DAIŞê ye. Rêbera vîzyona Sûrîyeya li ser serwerîya neteweyî ya burjuva ya erebî dewleta burjuva ya tirk a înkarker, mêtingehkar û kapîtalîst e.

Çarenûsa bi hezaran jinan hîn jî ne dîyar e. Çeteyên HTŞê bi taybetî li dijî jinên elewî yên li peravê bi komkujî, revandin û tecawizkirinê sûcên nû li sûcên xwe zêde dikin. Ji peravê revandin û firotina jinên elewî rastîya DAÎŞ bûna HTŞê ya ku xwe bi cilên fermî vedişêre eşkere kirîye. Bi heman awayê, tayînkirina kujerê Hevrîn Xelef wekî fermandarê Firq eya 86an a xeta Reqa, Hesekê û Dêra Zorê îtîrafkirina rastîya DAIŞê ye ku bi HTŞê ve hatîye veşartin. Ev helwesteka ji bo tirsandina şoreşa jin e.

Her çend ev rastîya HTŞê be jî, gavên ku emperyalîstên Fransa, Almanya, Emerîka û Îngilîstanê ji bo rewakirina HTŞê avêtine jî rastîya emperyalîstan eşkere dike. Ew jî dewletên sermayeya desthilatdarîya zilamperest a çînên mijokdar û mêtingehkar ên dijminê jinan in.

Em şoreşa xwe ya jinan biparêzin, têkoşîna ji bo sosyalîzmê mezin bikin.

Hev-nûnertî, di heman astê da rêxistinbûn û hêza parastina jinan banê sîyasî û birdozî yê şoreşa me ya jinan pêk tînin. Lêbelê, ji bo pêşxistina şoreşa me ya jinan, divê pozîsyona sîyasî û hişmendîya ku hatîye bidestxistin bi bingehek nû ya maddî ra bigihêje hev. Niha, bingeha aborî ya şoreşa me ji kapîtalîzmê derbas nekirîye. Û ev bingeha aborî, civak û têkilîyên ku bi wê ra lihevhatîne ferz dike. Hişê sîyasî û birdozî yê şoreşa me tenê dikare bi bingehek nû ya aborî ya sosyalîst vê bingeha aborî derbas bike. Bi gotineka din, bingeha maddî dikare bi bingeha maddî, û hişmendî jî bi hişmendî were guhertin. Û ev dikare bi şoreşek civakî pêkan be. Ji bo pêşxistina şoreşa me ya jinan, girîng e ku jinên karker, kedkar û bindest ên ji hemû netewe û bawerîyên kurd, ereb, ermenî, tirkmen, durzî, êzîdî, xiristîyan, elewî û misilman, di têkoşîna li dijî dagirkerî, mêtingehkarî û îstismarê da bibin yek û xwe bi rêxistin bikin. Eger yekem dabeşkirina çînî di dîrokê da bi desteserkirina keda jinan dest pê kirîye, werin em vê zincîra koletîyê ya yekem bi hêza şoreşa xwe ya jinan bişkînin û têkoşîna ji bo Rojava, Sûrîyê û cîhanê ya bê çîn, bê îstîsmar û wekhevîya zayendî mezin bikin. Werin em xwe birêxistin bikin. Tenê jinên ku xwe birêxistin dikin û ji bo sosyalîzmê şer dikin dikarin şoreşa me bigihînin armanca sosyalîzmê.

Di salvegera xwe ya 13emîn da bijî şoreşa me ya jinan, bijî sosyalîzm!

Ji Bo Çi Sosyalîzm

Ji bo me jinan girîng e ku em bizanin sosyalîzm çi ye. Wek jinên ku di şoreşa jinê da dijîn, me gelek destkeftî bi dest xistine. Lê têkoşîna me ya ji bo avakirina jîyaneka wekhev û azad berdewam dike. Têkoşîna azadîya jinan têkoşînek e ku îro dest pê kirîye û heta komunîzmê wê bidome. Em ji çi ra dibêjin komunîzm? Ew sîstemeka cîhanî ye ku tê da çîn, sînor û newekhevîya zayendî tune ye. Em, jinên komunîst, bawerîya xwe bi vê îdeolojîyê tînin û ev armanca me ya dawîn e. Lê em nikarin komunîzmê bi carekê bi dest bixin. Şoreşên demokratîk û şoreşên sosyalîst hewce ne heta ku em bigihîjin komunîzmê. Bi rastî jî, li dijî emperyalîzm, faşîzm, dagirkerîyê û mêtingehkaran şerkirin pêwîst e. Serdestîya mêr di rihê van hemû pergalan da cih girtîye. Divê li dijî serdestîya mêr bê navber têkoşîn bê kirin.

ÇÎN ÇAWA DERKETIN HOLÊ?

Dîroka hemû civakan, dîroka têkoşîna çînan e. Serdema yekem di dîroka mirovahîyê da civaka komunal a seretayî ye. Ev civak alîdayîk e. Di vê serdemê da jinan gelek keşfên zanistî kirin. Jinan dikarîn karên bijîşk, endezyar, astrolog, kîmyager, mîmar û hwd. bikin. Di vê heyamê da yekzewacî (monogamî) tune ye. Jîyaneka xwecihî tune, ne mîras û ne jî malbat nayê dîtin. Ev civak xwedî pergaleka komunal e, lê ew pergaleka kevnar e. Ew destpêka dîroka civakan e.

Piştî civaka komunal a seretayî, civaka koledar tê. Bi destpêkirina çandinîyê di civaka seretayî da, mirov êdî bêtir mudaxeleyî xwezayê dikin. Ji ber ku çandinî û çinîn dest pê kirîye, berhemên zêde tên hilberandin. Bi desteserkirina vê berhema zêde, çînên yekem bi rastî jî derdikevin holê. Ew kesên ku amûrên hilberînê kontrol dikin, yên din di bin zext û zorê da digirin. Û yekem cudahîya çînî di dîrokê da bi kolekirina jinan ji hêla zayenda mêr ve dest pê dike. Ji bo çandinîyê, divîyabû jîyaneka bicîhbûyî bihata pejirandin. Milkê taybet, gava yekem a civakên çînî ye. Ewên ku berhemên zêde desteser dikin, dibin yên pêşîn ên ku dewlemend dibin û yên din bi zorê dikin kole. Di dîrokê da yekem kole jin e. Di civaka koledarîyê da, kole û xwedîyên koleyan du çînên dijber in.

Feodalîzm ji sîstema koledarîyê der ketîye holê. Di vê pergalê da, ku xwedîyên erdên mezin bi cotkar û xulam ve girêdayî bûn, mirovahî hinekê pêşketîtir bû. Lê dîsa, xwedîyên axê dewlemend in û gûndîyên cotkar xizan in. Cotkar piranîya berhemên xwe didin xwedîyên erd, axa û began. Jin di vê demê da di bin zextek mezin da ne. Di fedolîzmê da, hilberîn li ser çandinîyê ye. Li bajêr, hilberîn li dikanên piçûk ên takekesî tê kirin.

Bi dahênana motorên dûkelê, serdemeka nû di dîroka mirovahîyê da dest pê dike. Niha, di demek kurt da, hejmareka mezin ji tiştan dikarin li ser makîneyên mezin werin hilberandin. Di vê pergala ku jê ra kapîtalîzm tê gotin da, xwedîyên sermayeyê û karker hene. Çîna burjuwa, ku ji hejmareka hindik ji mirovan pêk tê, xwedîyê amûrên hilberînê ye û keda karkeran dikire. Emperyalîzm qonaxek ji kapîtalîzmê ye. Kûrewîbûna emperyalîst ew aste ku kapîtalîzm di serdema me ya îroyîn da gihîştîye. Di kapîtalîzmê da burjuvazî û proletarya çînên dijber in. Çîna wan kesên feqîr û bindest ên ku ji bilî keda wan ti milkê wan tune ye proletarya ye. Ew nûnertîya piranîya cîhanê dikin. Ji alîyê din ve, burjuvazî bi rêya zor û dextê çavkanîyan bi dest dixe. Ew keda karkeran dikire. Bi hejmara xwe kêmtirîn çîn e. Di navbera van herdu çînan da çînên wekê nîv-proletarya, burjuvazîya biçûk, burjuvazîya navîn hene. Lê civak di bingeh da ji du çînên dijmin ên bingehîn, burjuvazî û proletarya, pêk tê.

Em jinên komunîst bawer dikin ku divê pergala kapîtalîst bi zorê were hilweşandin. Ji bo jiholêrakirina tebeqeyên di civakê da û pêkanîna wekhevîyê, divê proletarya, ku di cîhanê da piranî pêk tîne, çekdar bibe û şer bike. Proletarya dê bi zorê desthilatdarîyê bi dest bixe û burjuvazîyê hilweşîne. Bi vî awayî, veguherînek, ango şoreşek, dê çêbibe. Di vê têkoşînê da, divê jin hem ji bo jiholêrakirina çînan û hem jî li dijî serdestîya mêran şer bikin.

Di komunîzmê da, prensîp ji her kesî li gorî wesfên wî-wê û ji her kesî ra li gorî pêdivîyên wê-î ye. Ango, her kes li gorî wesfê xwe dixebite. Çiqas wesfê wê-î hebe jî, çiqas xebitîbe jî, qasî hewce dike distîne.

Di sosyalîzmê da, prensîb ji her kesî li gorî wesfê wê-î û ji her kesî-ê ra li gorî karê wê-î ye. Bi gotineka din, her kes li gorî wesf û tiştên ku dikare bike beşdarî hilberînê dibe. Lê belê, vê carê, her ku ew bêtir ked da, ew qas bêtir para xwe ji hilberîna giştî distîne.

DEWLET ÇI YE?

Dewlet ew amûr e ku bi rêya wê çînek li ser ya din serdest dibe. Di civaka komunal a seretayî da dewlet tune bû. Di civaka koledarîyê da, çîna koledar dewletên koleperest ava kirin da ku koleyan tepeser bikin. Di civaka feodal da, dewletên feodal rê didan xwedîyên erd û axayan ku li ser cotkar û xulamên xizan û bêerd serdest bibin. Di kapîtalîzmê da, dewlet ji bo tepeserkirina karker û kedkaran û îstismara wan hene. Di her serdemê da, şêweyên dewletê diguherin, lê armanca dewletê naguhere.

Di sosyalîzmê da, desthilata dewletê bi zorê, ango bi şer, bi xwînrijandinê, bi karanîna çekan û rêbazên cûrbecûr ên zorê ji alîyê proletaryayê ve tê desteserkirin. Ji ber vê yekê vê carê, karker, kedkar û bindest dewletê li dijî burjuvazîyê bi kar tînin. Ji niha û pê ve, divê dewlet gav bi gav ji holê rabe. Qonaxek tê gihîştin ku êdî pêwîstî bi dewletekê tune ye ji ber ku êdî çînek dijber tune ye. Ev qonax komunîzm e, ku tê da sînor û çîn li seranserê cîhanê têne hilweşandin. Kîjan çîn xwedîyê amûrên hilberînê be, ew dibe serdest. Di sosyalîzmê da, kontrola amûrên hilberînê bi şoreşekê dikeve destê proletaryayê.

Şoreşên demokratîk û sosyalîst heta ku komunîzm pêk neyê çêdibin. Têkoşîna li dijî emperyalîzm, faşîzm, mêtingehkarî û serdestîya mêran berdewam dike. Mînak, şoreşa me ya Rojava şoreşeka demokratîk e. Di heman demê da, bi têkoşîna jinan şoreşa jinan jî pêk hatîye. Têkoşîna jinan ji bo rizgarîya civakî di dîrokê da mil bi mil bi tevgerên sosyalîst ra pêşketîye. Her çend sosyalîzm armanc dikir ku newekhevîyên çînî ji holê rake jî, ji bo zordestîya li ser jinan çareserî pêşkêş kir û yek ji tevgerên sereka yên îdeolojîk ên pêşîn bû ku avahîyên serdestîya mêran xist lê pirsînê. Ji bo me jinan, têkoşîna çînî bi têkoşîna zayendî ve girêdayî ye.

Jinan di dema Şoreşa Cotmehê û piştî wê da, ku yek ji mezintirîn ezmûnên sosyalîzmê ye, destkeftîyên mezin bi dest xistin. Jinên komunîst ên wek Rosa Luxemburg, Clara Zetkin û Kolantai di têkoşîna li dijî dijminên çînî û serdestîya mêran da pêşengîya girseyan kirin. Ji ber vê yekê, divê jin sosyalîzmê fêr bibin û piştî Rosas û Claras têkoşîna çînî û têkoşîna zayendî bidomînin. Wekê ku Rosa Luxemburg gotîye, an hovîtî an sosyalîzm!

BERXWEDAN

Di 27ê Mijdarê da, Emerîka û hevkarên wê rêveberîya Sûrîyê radestî HTŞê ya bi serokatîya Colanî kirin û wî şûna rejîma Esed girt. Ji ber vê yekê pêvajoya sîyasî ya ku em tê da ne, li me ferz dike ku em HTŞê ji nêz ve nas bikin. HTŞê ya bi pêşengîya Colanî ku bi darê zorê ket nava jîyana me, îro xwe weke rêveberîya Şamê îlan kir. Divê em wek jin, bi zanîna dîrokê roja xwe bixwînin. Ji ber vê yekê pêşî da divê em fêr bibin ka Colani kî ye, kengî û çima HTŞ hate damezrandin.

Di sala 1990an da li Afganîstanê El Qaîde ya cîhadîst a îslama sîyasî derket holê. Di serdema dagirkerîya Iraqê da Colanî jî tevlî El Qaîdê bû û di nav da bilez bilind bû. Dema ku serokê El Qaîde Zerqawî mir, ew çû Lubnanê û piştgirî da rêxistineke din a cîhadî, Jund El Şam. Paşê dema vegerîya Iraqê, Emerîkayê Colanî girt û xist zindana bi navê Bucca. Emerîka li vir DAIŞ û bi rêya Colanî ra jî El Nusra afirand. Piştî ku Colanî 2 salan di vê girtîgehê da ma û perwerde dît, ji alîyê Emerîkayê ve bi bêdengî hate berdan. Dema derket derve bi serokê DAIŞê Bexdadî ra kar ki. Di sala 2012an da El Nusra di bin serokatîya Colanî da hat damezrandin. Di sala 2016an da navê wî kirin Enîya Fetihkirina Şamê. Piştî demeke kin, xwe belav kir û bû Heyet Tehrîr El-Şam. Vê rêxistinê li Idlibê dest pê kir û Idlib xist bin kontrola xwe. Di sala 2017 da, Emerîka ji bo vê rêxistina ku avakir û perwerde kir, pênaseya ‘rêxistina welatparêz a nerm’ kir’. Dema serokê çeteyan Colanî kravat li xwe kir û jê ra gotin El Şera, hewildan gel bixapînin.

Werin em pêkanînên vê dawîyê yên HTŞ ya îro hikûmeta Şamê ya îroyîn e jî bi bîr bînin. Gelê Elewî bi dirûşma “Xirîstyan ji Beyrudê ra, Elewî ji tabûtê ra” qetil kirin. HTŞ bû ku mêrên Elewî li kolanan wek kûçikan diewitandin û bi îşkenceyê dikûştin. Heman hikûmet e ku jinên Elewî li bajarên peravê yên wek Laziqîyê û Tartûsê direvîne û di berdêla pereyan da li Idlibê difiroşe mêran. Ew in ku piştî rûxandina rejîma Esed, di pîrozbahîyên ku li Helebê hatin lidarxistin da ji mizgeftan daxuyanî dan û ji jin û mêran ra gotin ku li cihên cuda pîrozbahîyê bikin. Yên ji ber ku xwestibû li Şamê mîtîngek ji bo mafên jinan rêxistin bike gef li jina bi navê Maribella xwaribûn, jî ew bûn. Jîyana jinan bi tena serê xwe qedexe ye. Jin bi tena serê xwe li qadeke giştî, yanî li kolanan nayê dîtin û pêwîst e mêrek ji malbata wê pê ra hebe. Di otobusan da mêr dê li pêş û jin jî li paş rûnin. Jin nikarin daxwaza berdanê bikin. Di bîra me da ye, dema ku jinek por vekirî dixwaze bi Colanî ra wêneyê bikişîne, bi nîşana Colani a ku dibêje “pora xwe bigre” talîmatek eşkere dide jinê jî desthilatdarîya HTŞê ye û ye ku destê wezîra jin a Fransî ku hatibû civînê nahejîne jî destilatdarîya HTŞê ye.

Yê ku li Helebê ji mizgeftan ferman dide jinan da ku hîcabê li xwe bike jî HTŞ ye. Heman hikûmeta HTŞê ye ku tevî eşkerebûna dîmenên Şadi El Veysi yên li nîvê kolanê îdamkirina 2 jinan jî wek ku bi hemû jinên ku têkoşîna mafan didin ra bikeve înadê ew wekî wezîrê edaletê nîşan da. Heman rêveberîya HTŞê ye ku kûjerê Hevrîn Xelef ku di dema bûyerê da dîmen da, di asta bilind da erkdar kir. Zenubya ku di dîrokê da Şahbanûya Palmîrayê bû, ji ber rêveberîya HTŞê ji pirtûkên dersê hat derxistin. Di heman demê da, berdevka HTŞê Ubeyda Arnavut daxuyanî da ku “avahîya bîyolojîk û psîkolojîk a jinan ji bo erkên rêveberîyê ne guncaw e”. Bi gotineke din, li gorî vê mantiqê jin ne wek Arîn Mîrkan û ne jî Sarya Özgür dikarin şer bikin, ne jî wek Îlham Ehmed bibin wezîr û ne jî di dadgehê da bibin xwedî biryar. Ji ber ku li gorî wan jin qels in.

Ji ber vê yekê îro jinên ku li Tişrînê bi bihayê xwîn û jîyanê şoreşa jinên Rojava diparêzin dijminên wan ên herî mezin in. Loma jî hemû leşkerên mêr kom kirin û ji bo ku Tişrîn bikeve şer kirin. Ji ber vê yekê ew qas israr dikin ku di makezagona nû da destkeftîyên şoreşa me derbas nekin.

Erka me ya îro ew e ku em destkeftîyên şoreşa xwe ya jinan bi xurtî hembez bikin û biparêzin. Mafê telaqê, mafê kar, mafê mîrasîyê, hevserokatîyê, kotaya jinan, sazîyên xweser ên jinan û hwd tenê hinek ji mafên ku me bi dayîna berdêleke giran bi dest xistine. Helbet şoreşa me ya jinan yekitîya bindestan ango hevgirtina jinan hîn kirîye û fêrî me dike.

Ji ber vê yekê bi jinên Elewî û Durzî ra yekitîya çarenûsa me heye. Duh me li Şengalê çi dîtibe Îro em dibînin ku Elewî û Durzî wê jîyan dikin. Weke Jinên Komunîst ên Şoreşger, em hem bi jinên ku dibin koçber û tên herêmên şoreşger ra hevgirtinê zêde dikin, hem jî polîtîkayên dijminê jinan ên HTŞê li her qada ku em hene, her derîyê ku em lê dixin û her jina ku em ava wê vedixwin eşkere dikin.

Di heman demê da îro cîhan xwe ji bo Şerê Cîhanê yê 3emîn amade dike. HTŞ ji bo gel û jinên Elewî yên ku berê çekdar nebûne, kuştin, destavêtin û frotinê rewa dibîne. Tevî ku hejmara gelê Durzî hindik bû jî, ji ber ku şerê çekdarî hilbijartibûn, bi qasî Elewîyan qetlîam derbas nekirin. Ji ber ku derfeta xwe parastinê di destê wan da hebû. Ji ber vê yekê em li dijî çeteyên cîhadî jî xweparastina çekdarî fêrê jinan dikin. Ji ber ku em ji dîrok û dîroka xwe ya şoreşê hîn bûne ku kes nikare gelekî rêxistinkirî têk bibe, em bang li hemû jinan dikin ku di sazîyên şoreşê û JKŞê da xwe birêxistin bikin. Em ê bi hêza xwe ya rêxistinkirî çeteyên Îslama sîyasî têk bibin.

Bijî Têkoşîna me ya Rexistinkirî
Bijî Şoreşa me ya Jinê

Tenderness malzarokê

Mala malzarokê organeke jinikê ye, bi şiklê silindrîk, bi qasî 2,5-4 cm dirêj e û dirêjahiya wê ji kesek bi kesek din diguhere. Di beşa jêrîn ya uterus de cih digire û uterus û vajînayê girêdide. Peldanka malzaroka malzarokê ji bo dîtina kansera malzaroka malzarokê ye û jê re dibêjin Pap test testa virusa papilloma ya mirovî.

Ev pêvajoyek hêsan dikare her anormaliyek ku zû dibe sedema penceşêra malzaroka malzarokê tespît bike. Di qonaxa ku îhtîmala dermankirinê zêde ye de, pişka malzaroka malzarokê hucreyên ku dikarin di pêşerojê de bibin kanserê diyar dike.

Smearkirina malzaroka malzarokê ji temena çalakiya zayînê, ango ji 21 saliya xwe heya 65 saliyê, bêyî îstîsna li ser hemî jinan tê kirin. Ew pêvajoyek hêsan û ewledar e, ku ji hêla peydakirên lênihêrîna tenduristiyê ve li navend û klînîkan têne kirin. Pêvajoyek bê zerar e. Bi muayeneyek rûtîn a pelvîk em dikarin pêvajoyek nerm pêk bînin.

Bi rebazê tıbbî ra test tê çekirin. Paşê van şaneyan di şilek taybet de têne danîn û dişînin laboratuarê.

Piştî ceribandinê:

Piştî pêkanîna testa Pap, jin dikare çalakiyên xwe yên rojane yên normal bike.

Divê kengê testa Pap Smear bê kirin? :

Pir jin divê di 21 saliya xwe de dest bi testên Pap-ê bi rêkûpêk bikin ji ber ku ew di xetereya kanserê an enfeksiyonê de ne. Vîrûsa papîllomaya mirovan a ku bi rêya zayendî tê veguheztin, li ser malika malzarokê an jî penceşêrê çêdike û diyar kir ku cureya vîrusa ku dibe sedema şêrpenceyê ji ya ku dibe sedema penceşêrê cuda ye. Penceşêr ji vîrusê heta bi salan piştî enfeksiyonê dernakeve. Li vir girîngiya testên pîskirina kansera malzaroka malzarokê, wek testa smear ji bo tespîtkirina zû ya penceşêrê û Pap smear ji bo enfeksiyonan heye. Bala xwe bidinê ku enfeksiyona bi vê vîrusê ne tenê sedema penceşêrê ye.

Bijîşk pêşniyar dikin ku ji 21 saliya xwe heta 65 saliya xwe sê salan carekê testa Pap bikin. Muayene piştî giheştina 30 salî her 5 salan carekê dikare bê kirin.

Doktorê we dikare bêtir caran testa Pap-ê bixwaze heke:

1- Lewaziya parastinê dibe sedema enfeksiyona bi vîrûsa kêmasiyê (HIV), ku dibe sedema AIDSê.

2- Pêkanîna neqla organan ku pêwîstî bi bikaranîna dermanên ku sîstema parastinê tepeser dikin heye.

3- Tespîtkirina şaneyên pêşpenceşêrê bi rêya testa parzûna malzarokê.

4- Kemoterapî an jî bikaranîna kronîk a dermanên kortikosteroîd.

5- Bikaranîna dermanê "dîetîlstilbestrol" berî zayînê.

Jin bi gelemperî piştî 65 saliya xwe ne hewce ye ku testa Pap-ê bike ger encamên hemî ceribandinên heya vê gavê dilnizm bin.

Gelek caran muayeneya Papanicola têtе kirin:

Hejmara carên ku ceribandinek Papanicola tê kirin ji hêla faktorên cihêreng ve, tevî temen û xetereyê, têne destnîşankirin.

-Piştî ku temenê yê hilbijartî bibe 21 sal, her 3 sal carekê pêwîstiya wê bi testa handana zayendî heye.

-Ji temenê 21 salî heta 29 salî, muayene her 3 salan carekê tê kirin.

-Ji temenê 35 salî heta 65 salî, muayene her 3 heta 5 salan carekê tê kirin.

-Ji temenê 65 salî û jor de, dibe ku hûn ne hewceyî testên Papanicola nebin.

- Encama testa smear ya malzarokê tê çi wateyê?

Encam bi hin xalan ve girêdayî ye:

1- Encam an normal e, ne diyar e, an jî ne normal e. Vedîtina şaneyên nenormal bi karanîna vê testê nayê wateya pejirandina kanserê.

2- Hebûna van şaneyan dibe ku sedemên din hebin, wek iltîhaba yan jî guherînên lîmfatîk di şaneyan de ku piştî demekê bixweber winda dibin.

3- Di vê rewşê de gelek caran doktor daxwaz dike ku piştî çend mehan carek din muayene bê kirin.

Encama ne diyar bijîjk neçar dike ku ceribandinên din bike da ku piştrast bike, an jî piştî demek nêzîktir li bendê bimîne û çavdêriya nexweş bike heya ku ceribandin piştî şeş meh an salek were kirin.

Encamên ne normal bi vî rengî têne şîrove kirin:

Hucreyên squamous ên atypical, ku dikarin ji hêla HPV ve têne çêkirin.

Ew dibe ku penceşêrê be.

Di dawiyê de, dema ku testa Pap guhertinên ne normal nîşan dide. Zêdetir ceribandin an şopandin hewce ye, û guhertinên piçûk bi gelemperî ji guhertinên giran pirtir in. Bi gelemperî ew bi xwe derbas dibe, ji ber vê yekê ne hewce ye ku hûn bitirsin Ya herî girîng ew e ku hûn bi doktor bawer bikin û piştî şeş mehan an salek muayeneyan dubare bikin.

-Dûr ji vê nexweşiyê

"HPV" papillomavirusê mirovan

STI li Amerîkayê vîrusa herî berbelav e û vîrusek ku bi riya zayendî tê veguheztin e.

Enfeksiyona virusê ya herî gelemperî ya rîya zayendî.

Ji 100 jinan 80 wê di jiyana xwe de HVP çêdibe. Veguhestina bi têkiliya cinsî Rêjeya enfeksiyonê 65 ji 100 e.

Faktorên rîska veguheztinê:

1- Hejmara hevjînên seksî yên jiyanê.

2- Ciwanî

3- Cixare kişandin

4- coc2 “hebên jidayikbûnê”

5- Veguheztina dervayî çerm.

Wusa dixuye ku HVP di heyama neonatal de bi rengek ne-invasive tê veguheztin. Yekane HVP-ya klînîkî ya ku di jidayikbûnê de hatî tespît kirin lavryngedlpapillomatosis e. Sedema wê ya bingehîn HVP 6-11 e.

Pêşveçûna normal lê HVP:

Piraniya bûyerên enfeksiyona HVP demkî (bênîşan) û subklînîk in.

Dema navînî ya enfeksiyonê 8 meh e

Di nava du salan de ji 100 bûyeran 90 sax dibin.

Vîrûsa DNA ji malbata papillomavirusan e, û celebên xeternak hene ku dibin sedema kansera malzarokê.

HVPi6 kansera pola bilind e.

Kansera potansiyel a HVP:

Di jinan de: kansera malzarokê.

Di mêran de: kansera oropharyngeal.

- Vakslêdana li dijî HVP 16 heta 18 (ew rîskek mezin a peydabûna penceşêra malzaroka malzarokê hildigirin).

Derziyek di navbera 9 û 26 salî de tê dayîn. Ew dikare berî temenê çalakiya zayînê were derzî kirin û ji enfeksiyona bi vîrusên ku dibin sedema penceşêra malzaroka malzarokê diparêze.

Dîrokek Wiha Hat Nivîsandin

Yekemîn rêbera komunîst a nezerîya rizgarîya jin Clara Zetkîn di sala 1857an da li Elmanyayê di malbet û derdoreka burjuva da mezin dibe. Clara ciwantîya xwe li Elmanyayê derbas dike. Ew dibistana mamostetîyê dixwîne û hîna di emrê xwe yê 16 salî da dibe mamoste.

Dema pêvajoya dibistanê da fikrên sosyalîst û komunîst nas dike. Bi kesayeta xwe ya pirsker tevlî nîqaşên li ser sosyalîzmê dibe. Ew êşa gelê bindest û êşa, xizanî û newekhevîtîyên jinan di zaroktîya xwe da çavdêrî dike. Ev rewş di bûyîna sosyalîst da bandoreka mezin dike li wê dike.

Clara di salên 1878an da li dibistanê Partîyê Demokrat ê Komelî yê Elmanyayê (PDKE) ê ku bi rêbertîya August Bebel hatibû damezrandin nas dike û tevlî civîn û nîqaşên partîyê dibe. Di ev civîn û nîqaşên partîyê da şoreşgerê Rûs Ossîp Zetkîn nas dike. Ossîp Zetkîn di rêxistinbûn û pêşketina Clara da rolek taybet dilîze. Hevaltîya wan bi zewacê berdewam dike.

Faşîzma Elmanyayê bi pêşengtîya Bîsmark li dijî demokrasîya komelî dii 1978an da zagona antîsosyalîst derdixe. Teva vê li dijî şoreşgerên demokrat ên komelî êrîş û komkujîyên gelekî berfireh tê destpêkirin. Rêxistin û komeleyên karker, kedkaran, hemû weşanên demokrat û sosyalîst tên qedexekirin. PDKE hatibû anîn rewşeka îlegal. Clara ruxmê van êrîşan û dexta malbata xwe têkilîya xwe ya bi partîyê ra qut nekir û hîna zêdetir pêş ket û erkên zêdetir girt ser milên xwe.

Li dijî van êrîşan gotina wê ya“Partî şer dike ji ber wê jî têk naçe” hişmendîya wê ya serkeftinê bû. Di 1880an da Ossîp Zetkîn ji ber xebatên xwe yên îlegal hat mişextkirin (sırgunkirin). Piştî demeka kin Clarayê jî welatê xwe terikand. Wê di jîyana mişextîyê da biryara xwe nezirkirina şoreşê da û di xebatên îlegal da roleka girîng lîst.

Di dirêjahîya sedsala 19emîn da, di nava rastîya heyî ya tevgerên şoreşger da jinên kedkar ku derketin pêş rêberên xwe yên jin jî afirandin. Clara jî yek ji rêberên ku lêgerîna azadîya jinê bi şerê çîna proleteryayê ve kirîye yek e. Gotina wê ya “Li Ku derê jîyan hebe ez dixwazim li wir şer bikim” biryardarîya wê ya ji bo gel û jinên bindest nîşan dide.

Clarayê nêrîna xwe ya sosyalîst a cîhanî li ser bingeha berhemên Marks, Encilos û August Bebel pêş xistibû. Rêwîtîya dîrokî ya jinên karker û kedkar bi axaftina ku Clarayê ya di sala 1889an da di civîna avakirina enternasyonala Parîsê da kir destpê kir. Wê tu carî Marksîzm weke qalibekî negirt dest. Bi nezerî û analîzên xwe yên derheqê azadî û rêxistinbûna jinê hem di milê têkoşîna ya cinsî da tevkarîyeka mezin ji Marksîzmê ra dikir, hem jî di dîroka têkoşîna tevgera sosyalîst û komunîst a cîhanê û dîroka şerê çînî yê proleteryayê da rûpeleka nû vedikir.

Ew axaftina Clarayê ya ku rêya têkoşîneka dîrokî vekir, li dijî kapîtalîzm û serdestîya mêr bû çirûska têkoşîna azadîya jin. Clara Zetkîna ku di têkoşîna azadîya jin da, bi hişmendîya zayendî û bû rêbera komunîst a jinên proleter û kedkar. Ew tenê bi afirandina nezerîya azadîya jinên proleter sînordar nema, di heman demê da bû pêşenga rêxistinkirina tevgera jinên komunîst jî. Wê rastîya azadîya jinê û li dijî kapîtalîzmê mezinkirina têkoşîna proleterya jin û mêr baş fêmkiribû. Ev jî bingeha nezerîya me ya îro ya avakirina tîfaqa jin û mêr e.

Di nav PDKE da rêxistinbûna jinên sosyalîst yekem bi pêşengtîya Clarayê tê avakirin. Ji ber vê hemû rastîyên em ser Clarayê vefibêjin daneyên şoreşa jinê ya îro jî dihewîne. Bêguman wesfa herî xurt a rêbertîya Clarayê avakirina têkilîya di navbera nezerî û pratîkê ye. Ji bo wê felsefe, nezerî û pratîk bi gireyên kûr bi hevdu re girêdayî ye.

Bi saya ev têkoşîna bêhempa, jinên Elmanî di navbera salên 1900 û 1900an da mafên xwe yên rêxistinbûnê bidestxistin, di jîyan û sîyasetê da bûn hêzeka çalak. Clarayê di wê demê da di nivîseka xwe da wiha digot: “Dema ku wezîr, qeymeqam û serokên dewletê her ku mezinbûna sosyalîzm û cîhana jinên proleter-karker bibînin dê hîna zêde biqîrin”. Wê wekî ku di gotina xwe da dianî ser ziman ji Elmanyayê heta Nemsa, Fransa û şoreşa Sovyetan li her dera ku jîyan tê da şîn dibe ji bo rizgarîya gelên bindest û rizgarîya jinan têkoşîn kir.

Daxwazên wekî “Berfirehkîrîna zagona parastina jinên karker” , “Di febrîqeyan da bicihkirina kontrolkerên jin” , “Ji bo karê wekhev mûçeya wekhev” , “Wekhevîya kamil a polîtîk” , “Perwerdeya wekhev û derfeta karê serbest” , “Ji bo mafên xweser ên jinê da wekhevî” naveroka şoreşa civakî hîna xurttir dike. Ev di milê daneheva dîrokî ya têkoşîna azadîya jin da vegotina hişmendîya kûrbûna nezerîya şoreşa jin a ku dîyarî hemû jinên kedkar kirîye ye. Di vê mijarê da nêrîna wê ya herî bingehîn “şoreş bê jin nabe” ye.

Clara di heman demê da pêşenga ragihandina tevgera jinên komunîst e. Rojnameya bi navê “wekhevî” ya jin ji bo têkoşîna Clarayê dibe amûrekî gelekî çalak. Wê bi rêya rojnameya “Wekhevî” da ji mijarên pêwîstîya rêxistinbûna jinê heta pirsgêrêkên rojaneyî, ji naveroka şoreşa civakî heta mijarên navneteweyî, ji bîrdozî, nezerî, sîyaset û şerê çînî yê proleteryayê qadeka çalak a têkoşînê afirand. Bi saya vê têkoşînê bi mîlyonan jin tevlî çalakîyan bûn. Ev serkeftina bêhempa encama rêbertîya rast a sîyasî û rêxistinî ya Clarayê bû. Clarayê hîna di salên 1896an da digot: “xebata jinê zehmet e, fidakarîyên mezin dixwaze, lê ev fidakarî mecbûrî ye û dê bê xelatkirin”. Di sala 1907an da kongreya yekemîn a jinên sosyalîst li ser vê hêzê mezin bû.

Rêxistina enternasyonala jinê bi rêbertîya Clarayê û amadekarîya jinên komunîst ên Elman hate avakirin. Di vê kongreyê da biryara têkoşîna mafa dengdanê derket. Kongreya Navteweyî ya jin a 2emîn ku di sala 1910an da kom bû jî ji bo piştgirî û yekîtîya enternasyonal a jinên kedkar roleka girîng lîst. Claraya ku bi pêşnîyara xwe ya sala 1911an 8ê Adarê dîyarî hemû jinên kedkar ên cîhanî kir di dîroka jinên kedkar ên cîhanê da rûpeleka nû vekir.

Clarayê di serdema şerê 1emîn ê cîhanê da li dijî şerê emperyalîst tevgera aştîyê ava kir, ji bo piştgirîya şoreşa Sibatê ya Rûsyayê karkerên Elmanî derxist kolanan. Clarayê li dijî ji şoreşgertîyê paşveketina PDKE têkoşîneka stemkar meşand û piştî îxaneta partîyê bi kelecaneka mezin berê xwe da şoreşa sovyetê bû. Bi daneheva xwe ya dehan salan bû yek ji rêberên şoreşa cotmehê jî.

Claraya ku helbestvan Aragon di helbesteka xwe derheqê wê da digot: “Jina pêşerojê, lê di esasê da jina îro” li her dera ku jîyan kir û ji bo çîna karkeran proleteryayê şer kir pêşeroj û berdewamîya jinên bindest ava kir.

Xeyalên Şehîdên Pirsusê Bi Destê Jinên Ciwan Mezin Dibe!

Şoreşa Rojava, bi taybetmendîya xwe ya şoreşa jinê, ji bo jinên li çaralîyê cîhanê pir girîng e. Ji ber ku şoreşa jinên Rojava hêvîya jinan, bi taybetî me jinên ciwan, ji bo pêşerojê zindî dihêle. Heta niha, ji ber pergala eşîrî an jî zexta malbatê, gelek tiştên ku em naxwazin neçar dimînin ku bikin. Bi rastî, weka jinên ciwan, me ji jîyana ku em dijîn zêde kêf negirtîye. Lê îro, şoreşa jinên Rojava ronîyek hêvîyê ye ku pêşeroja me dikare çêtir be. Ew nîşanî me dide ku cîhanek cûda pêkan e. Belê, hîn jî rewş hene ku em neçar in an jî ev zext hîn jî berdewam dike, lê naha em dikarin îradeya têkoşîna ji bo xewnên xwe nîşan bidin. Em bang li xwişkên xwe yên ku nikarin vê îradê nîşan bidin dikin ku îradeya xwe zêde bikin û ji bo vê hêza xwe birêxistin bikin. Ev zehmetî û têkoşîn ne tenê li ser axa me, lê di heman demê da li deverên din ên Kurdistanê û bi rastî li seranserê cîhanê jî têne jîyîn. Ger em, wekê jinên ciwan, ji bo azadîyê têkoşîn nekin, em li cîhekê di navbera çar dîwaran da, li dibistanan, li kar girtî ne. Şoreşa jinan a Rojava hêvîya hilweşandina van dîwaran û xilasbûna ji vê rewşa asêmayî da me.

Kobanê hatibû wêrankirin û pêdivî bi ji nû ve avakirinê hebû. Ji bo ji nû ve avakirina Kobanê wan wek ciwanên welatparêzên sosyalîst, wek ciwanên komunîst, destên xwe danîn bin kevir. Hemleya "Me bi hev ra parast, em ê bi hev ra ava bikin" navnîşana rêwîtîyek wisa bû. Xwesteka dîtina vê hêvîyê bû ku di sala 2015an da bi sedan jin û mêr ji Bakurê Kurdistanê û Tirkîyeyê anî ba hev û ew derxistin rê. Federasyona Komeleyên Ciwanên Sosyalîst (SGDF) rêxistinek ciwanan bû ku ev hêvî xwedî dikir. Di sala 2015an da, li gelek bajarên Tirkîye û Bakurê Kurdistanê hemleyek ji bo ji nû ve avakirina Kobanê, ku hatibû wêrankirin, hate destpêkirin. Wan dixwest li Kobanê nexweşxaneyek, daristanek, pirtûkxaneyek û parkek zarokan ava bikin. Li her bajarî hemleyek alîkarîyê dan destpêkirin. Her tişt ji cil, pêlav, pêlîstok, alavên tenduristîyê û pirtûkan berhev kirin. Dê 300 kes bihatibana rex me û êşa me derman bikirana. Di nav wan da dê û bav hebûn, lê piranîya wan di heman temenê me yê niha da bûn. Ew xwendekarên amadehî (sanewî) û zanîngehê bûn. Wan dê zanîngehên xwe, yên ku em xeyal dikin, bihiştibana û ji bo me bihatana vir. Ew mamoste, bijîşk, endezyar, rahênerên werzîşê, muzîkjen û hwd. bûn.

Ew ê di 20ê Tîrmeha 2015an da, roja piştî salvegera şoreşê, li vir bûna. Di wê rojê da, dema ku 300 kes dixwestin daxuyanîyek çapemenîyê bidin û werin vir li navçeya Pirsûsê ya Rihayê li ser sînorê Bakurê Kurdistanê yê li bajarê Kobanê, çeteyekê DAIŞê xwe teqand. Çeteyên ku dixwestin tarîtîya xwe belav bikin, nehiştin ku ew werin ba me. 33 ji wan şehîd bûn. Ji 33 şehîdan 10 jê jin bûn. Lêbelê, xewnên çeteyan ên belavkirina tarîtîyê ji alîyê şervanên YPG, YPJ û MLKPê ve pêşî li Kobanê û dû ra li tevahîya Bakur û Rojhilatê Sûrîyeyê hatin hilweşandin. Xwedî derketina kesên ku piştî komkujîya Pirsûsê nemir bûn, hewldanên DAIŞê yên bi vê komkujîyê tirsandina jin, ciwan û bindestan pûç kir. Me li Kobanê parkek û daristanek li ser navê wan vekir. Me xewnên 33 rêwîyên xeyalan, kirin rastî.

Belê, dibe ku me qet ew nedîtibin. Lê me qet tiştê ku wan dixwestin ji bo me bikin, xewn û armancên wan nîvco nehiştîye. Ezgî Sadet, Nazegûl Poyraz, Polen Ünlû, Bûşra Mete, Nazlî Akyürek, Duygu Tuna, Nuray Koçan, Ece Dînç, Ferdane Kiliç, Aydan Şalcî, Cebraîl Günebakan, Yunus Emre Şen, Cemîl Yıldız, Osman Çîçek, Mûrat Yûrtgûl, Serhat Devrîm, Okan Pîrînç, Veysel Ozdemîr, Alîcan Vural, Kasim Deprem, Medali Barutçu, Îsmet Şeker, Evrîm Deniz Erol, Mert Comert, Koray Çapoglu, Vatan Budak, Nartan Kiliç, Çagdaş Aydin, Alper Sapan, Erdal Bozkurt,Emrullah Akhamûr, Sûleyman Aksu û Ûxûr Ozkan...Yê ku ew derxistin vê rêyê hebûna şoreşê bû. Ma em hemû ji vê tirsa ku em jin bindest bibin, paşguh bibin, werin kuştin, rastî tundûtûjîyê werin, rastî tacîzê- tecawizê werin, ne westîyane? Tenê tiştê ku vê pergala serdest a mêran biguherîne, îhtîmala jîyan û belavbûna vê şoreşê ye. Wek jinên ciwan, parastina pêşeroja me bi parastina şoreşa Rojava, zindî hiştina 33 şehîdan e.

Wek CKŞ-Jin, em ê îsal 33 şehîd û 10 şehîdên jin ên di nav wan da bi şîara "Xeyalên Şehîdên Pirsusê bi destê jinên ciwan mezin dibe" bi bîr bînin. Em ê daran biçînin, perwerdan bidin, turnuvayên futbolê rêxistin bikin, bîranînan li dar bixin, pêşangehên wêneyan vekin û helbestan ji bo bîranîna wan binivîsin. Bi bîranîna ku em ê di 20ê Tîrmehê da li Kobanê li dar bixin, em ê careka din ji kujer û dagirkeran ra biqîrin ku em ê wan di 10 salan da jî di 100 salan da jî ji bîr nekin. Îro, em di temenê ku ew nemir bûn da ne. Ger wan di sala 2015an da ji bo me eşya berhev kirin û sînor derbas kirin, divê em ji bo wan xwe birêxistin bikin, şoreşa xwe biparêzin û mezin bikin.

Divê em wek jinên ciwan, wek ciwan çi ji destê me tê bikin da ku em xewn û îdealên wan pêk bînin û ew zindî bimînin. Tenê bi vî awayî em dikarin deynê xwe yê ji wan ra bidin. Divê em rêya şehîdên mîna şehîd Roza, şehîd Sarîn, şehîd Îsyan, şehîd Şafak, şehîd Dilşer bişopînin, ku di dema komkujîya Pirsûsê da li wir bûn û paşê ji bo tola 33 şehîdan hatin Rojava. Divê em bibin pêşengên jinên ciwan ên mîna şehîd Zîlan Destan. Tenê bi vî awayî em dikarin şehîdên Pîrsûsê û xeyalên wan zindî bihêlin.

Şehîdên Pîrsûsê nemir in.
Jin, Jîyan, Azadî!
Xeyalên Şehîdên Pirsusê bi destê jinên ciwan mezin dibe!

Di nava rojên me da rojane jin têne qetilkirin û tecawiz kirin. Rojane jin li rastî feraseta pergala zilamperest tên .

Û di van deman da jin li rastî gelek pêvajoyan hatin. Ji ber ku di serî da jin hêzeka bingehîn a avakerê şoreş û bingeha avakirina serhildanan e. Em bi kîn û bawerîyeka mezin ji bo tolgirtina jinên elewî dibêjin ku em li virin. Em ji şoreşa Rojava ji bo jinên berxwedêr yên elewî silav dişînin. Me ji bo piştgirîya jinên elewî xebatên rêxistinî li dar xistin ta ku jinên hene jî bibînin ku pêwîst dibe bi yek deng û yek destî dengê JIN JÎYAN AZADÎ were bilind kirin .

Her wiha li hemû qadên me Jinên komûnîst ên Şorşger ji bo piştgirîya jinan û birêxistinkirina wan xebatên cur be cur li dar xistin. Weke hemleya 1ê gulanê di bin dirûşmeya "keda jinê jîyan û civakê ava dike" da meşandin. Her wiha hemleya ji bo piştgirîya jinên elewî bi durşmeya "emê tekoşîna ji bo azadîya jinên elewî bilind bikin" da meşandin.

Ev xebat di rojeva me da ciheka giring digre, ji ber ku gava yekem a xilas kirina jinan ji zicîrên qeydê xebat û birêxistin kirine. Her wiha bi perwerde kirin û pêşxistina zanebûna jin dengê azadiyê gur dibe. Me jî di van deman da ji bo hemleyên xwe yên hebûn xebatên xwe dane meşandin. Weka hemleya ji bo 1ê Gulanê, vê hemlê ciheka xwe giring di nav xebatan de list. Ji ber ku bi hemleya rêxistinê, rêxistinkirina jinan berfireh dibe û gotina azadî yek dibe. Weka ku me di serî da anî li ser ziman ku xebatên me yê ji bo jinên elewî jî hebûn. Wê xebatê piştgirîya jinan da xuya kirin. Xuya bû ku jin jine çi elewî be çi kurd be, di serî da ji nasname ya ku em ji bo wê têdikoşin jin e. Ji bo rizgarkirina jinên ku di destên pergala desthiladar û faşîst da ne, pêwîst dibe rojane jin di vê mijarê da şîyar bin. Bizanibin ku dujmin di serî da êrîşên xwe li ser hêz û zayenda jinê dike. Ji bo ku bihêle jin her dem hîs bike ku ew hêzeka lewaz e. Me ev di gelek pêvajoyan da dît. Mînak; jinên elewî,durzî... Ji ber vê jî em dixwazin ku bi van xebatan dengê xwe bighînin hemî jinên ku hene; “tu hêz nikare xwe li ser hêza we ferz bike, tu îrade nîne ku dengê we bibire”. Ji ber vê yekê jî me di civînên malan da û di hemleyên xwe da pişgirîya xwe bi rengên cur bi cur anî ser ziman.

Kobanê:

Ji bo piştgirîya jinên elewî JKŞê bi hemleyekî mezin kar û xebatên xwe da meşandin. Di nav van da îmze kom kirin û yek yek, derî bi derî li taxan gerîyan. Li ser rewşa jinên elewî nîqaş kirin, ev xebat hişt ku dengê êşa bi hezaran jinan bighêje hev û yekbûna jinên bindest derxist holê.

Endamên JKŞê rojnameyên Raperîn belav kirin Endamên JKŞê maseyek vekirin li ser îdilojîya koletî li ser jinan a Tehrîr el Şam HTŞê, di vir da endamên JKŞê bang li hemû jinan kirin ku têbikoşin û xwe birêxistin bikin. Her wiha ji bo xebatên 1ê Gulanê JKŞê wêne li ser dîwaran daliqand û belavok belav kirin. Ji bo 1ê Gulanê bi jinan ra civînên malan hatin çêkirin. Bang li hemû jinan kirin ku dakevin qada 1ê Gulanê, ta ku ev roj bibe roja tekoşîna li dijî dewletên desthiladar. . Li ser gora Şehîd Destan Temmuz mûm pêxistin . Bi soza şopandina xeta şehîdan jî bi dawî kirin. Bi van kar û xebatên ku hatin meşandin karekî rêxistinî hat kirin.

Qamişlo:

